Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :962 11-Gulan- 2022 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

## Eleqeyeke mezin nîşanî ‘Şingal-Hêza Jinê’ dan

**Lîstika bi navê ‘Şingal-Hêza Jinê’ ya Koma Şanoyê ya Volskbuhne Baselê li Zurîhê rastî eleqeyeke mezin hat.**

Koma Şanoyê ya Volskbuhne Baselê qetlîama ku DAÎŞ’ê kiribû û geşedanên piştî rizgariya Şingalê kir lîstikeke şanoyê. Anîna Jendreyko derhêneriya lîstikê kir û muzîkên lîstikê ji aliyê Suleyman Çarnewa, Sosin Sevsen û Metîn Yilmaz hatea kirin. Ji 30’ê Nîsanê û vir ve li Fabrîktheaterê ya li bajarê Zurîhê 4 rojan lîst. Bilêtê lîstikê zû qediyan.

Di lîstikê de jinên Êzidî di serî de jiyana wan a piştî rizgarbûna ji DAÎŞ’ê tê qalkirin û di lîstikê de dîmenên li ser Şingalê di nav hev de hatin nîşandan. Ligel ku cihê rûniştinê nema jî hinek temaşevan bi israr xwestin lîstikê temaşe bikin û li dêrencekan rûniştin. Piştî ku lîstik qediya temaşevanan demeke dirêj li çepikan dan.

Nivîskar û derhênera lîstikê Anîna Jendreyko got “Di dema qetlîama Şengalê de korîdora ji Rojava ber bi Şengalê ve hatibû vekirin gelekî girîng bû. Lê gelek Ewropî bi vê rewşê nizanin. Me bi vê lîstikê hewl da qala vê korîdorê û guherandina jiyana li wir kir.”

Beriya ku lîstik were destpêkirina eywana lîstikê tijî bû. Herî zêde jî jinên ciwan hatibûn temaşekirina lîstikê. Piştî lîstikê derhêner û lîstikvanan gotûbêje kirin.

Wê Koma Şanoyê ya Volskbuhne Baselê bi vê lîstikê di 10’ê Gulanê de li bajarê Reûtlîtgen ê Elmanyayê li ‘Kulturzentrûm Franz K.’ û di 13’ê Gulanê de jî li bajarê Bochûmê wê li ‘Kunstmeseum Bochum’ê lîstikê bilîzin.

*ANF*



## Ji ber germa zêde paşrojek xirabtir li benda Hindistan û Pakistanê ye

**Ev du meh in li Hindistan û Pakistanê germeke pir zêde heye. Zanyar hişyariyê didin ku, paşrojeke xirabtir li benda van welatan e.**

Başûrê Asyayê ku xwedî nifûsek ji milyarek zêdetir e, bi ketina mehên Adar û Nîsanê de rastî germa zêde hat. Beriya destpêkirina demsala mûsonê jî pileya germahiyê di ser 40 pileyî re bû, lê ev heyam hîn neqediyaye.

### GERMA ZÊDE DIBE KU BI HEZARAN KESAN BIKUJE

Zanyarê ji koma Berkeley Earth Robert Rohde hişyarî da û got, “Ev germa zêde dikare bi hezaran mirovan bikuje.”

Hat diyarkirin ku, bi taybet hejmara miriyên extiyar û feqîr dê paşê bê ragihandin.

Wezareta Zanistên Erdê ya Hindistanê diyar kir ku mirina bi germa zêde ya li welêt ji sala 1980’î vir ve ji sedî 60 zêde bûye.

Serokê Rêxistina Meteorolojiyê ya Cîhanê (WMO) Petteri Taalas di daxuyaniya xwe ya hefteyê da destnîşan kir ku germahiya hewayê li ser çandinî, av û enerjiyê tesîreke berbiçav dike.

### BÛYERA HEYÎ NE SURPRÎZ E

Ji bo zanyarên avhewayê, ev ne surprîz e. Lêkolînerê Zanîngeha Hawaii Camilo Mora ji AFP axivî û got, “Tiştê ku min matmayî dike ev e ku pir kes tevî hişyariyên demdirêj ên ku felaketên weha nêzîk in tên dayîn, mirov matmayî dibin.”

Mora ji Hindistan û Pakistanê re got, “Ev beşa cîhanê û deverên herî tropîkal di nav deverên herî xeternak ên germahiya zêde ne.”

Mora û ekîba wî di sala 2017’an de lêkolînek weşandin, texmîn kirin ku hema hema nîvê nifûsa cîhanê her çend germahiya gerdûnî ji 2 dereceyên derbas nebe jî wê demê heta sala 2100 herî kêm 20 rojên salê dê di bin “germa kujer” de bimîne.

Zanyar hewl didin ku rêjeya germbûna gerdûnî ya di germahiya zêde ya li Başûrê Asyayê de hesab bikin.

Pisporên ji Panela Navdewletî ya Guhertina Avhewayê (IPCC) ji bo Hindistan û Pakistanê pêşbîniyê “xurttir, dirêjtir û pir caran tundtir” dikin.

Germa zêde, bi nemiyê re, hê xeternaktir dibe. Ev wekî “germahiya ampûlê şil” tê zanîn, an diyardeyek ku ji hêla TW ve tê pîvandin, ku şiyana laş ji bo kêmkirina germahiya xwe bi terbûnê dihesibîne.

Di pêla germê ya 2015’an de ku li Hindistan û Pakistanê zêdetirî 4000 kes mirin, “germahiya ampûlê şil” gihîşt 30 pileyî WBT’ê.

*ANF*



## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Ardû | Tiştên ku agir bi wan pê dikeve; weke êzing, dar û tiştên wisa. |
| Deklarasyon (Fransî) | Ragihandin, daxuyanî, danezan: Bi deklarasyonekê serxwebûna xwe ragihand. |
| Defakto (Latînî) | Tişta ku dibe û pêk tê lê ne fermî: Başûrê Kurdistanê defakto dewlet e. |
| Heman | 1. Tiştên, yan kesên weke hev, eynî: Em heman tiştî dixwin. 2. Du karên di yek zemanî de: A, di heman demê de du karan bi hev re dike. |
| Meteor (Fransî) | Kevirên ji ezmanan dikevin dinyayê. |
| Nostaljî (Fransî) | Hestê bîrîkirina tiştên bedew yên berê. |
| Pêşeng | Rêber, serok, mezin, rêzan: A, pêşengekî pir baş e. |
| Pêşengî | Rêberî, serokî, mezinayî, rêzanî: A, pêşengiyeke pir baş dike. |
| Pêşniyaz | Pêşniyar, pêşkêşkirin, teklîf. Ji bo ku bê pejirandin, pêşkêşkêşkirina daxwaziyekê: Al, pêşniyaz kir ku riya kolanê bê çêkirin. |
| Reaksiyon (Fransî) | Bertek, nerazîbûn, li hemberî tişteki diyarkirina helwestê: Li hemberî axaftina wî reaksiyon nîşan da. |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | S | Ê | ■ | D | A | D | ■ | R | E |
| 2 | Î | ■ | Ş | ■ | D | U | Ş | E | M |
| 3 | ■ | H | Ê | J | A | ■ | A | Ş | ■ |
| 4 | D | ■ | T | O | R | I | N | ■ | K |
| 5 | E | Ç | ■ | V | ■ | L | O | R | Î |
| 6 | K | A | B | A | L | A | ■ | A | ■ |
| 7 | ■ | R | ■ | N | A | M | E | ■ | A |
| 8 | H | I | L | ■ | V | ■ | N | A | L |
| 9 | O | X | ■ | X | A | N | Î | ■ | A |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | ■ | | | ■ | | | |
| 2 | | ■ | | ■ | | | | | ■ |
| 3 | | | ■ | | | | ■ | | |
| 4 | | ■ | | | | ■ | | ■ | |
| 5 | ■ | | ■ | | ■ | | | | |
| 6 | | | | ■ | | | | | |
| 7 | | | ■ | | | | | | ■ |
| 8 | ■ | | | ■ | | | | ■ | |
| 9 | | | ■ | | | | ■ | | |

### ÇEP-RAST

1. Plakaya navneteweyî ya Îranê... Notayek... Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku wekî sembola hêzê bi kar tînin
2. Lehengê destana Newrozê
3. Kurteya ajansa fermî ya Tirkiyeyê... Edalet... Yezdanekî misrî
4. Şaxên nebatên weke zebeş, petêx, kundir hwd. yên li ser erdê
5. Di şanoyê de mêrê ku di dilqê jinê de derdikeve ser sehneyê
6. Ji bo dem û zeman, nîveka destpêk û qedanê... Bêjinga ku dexlê ji hev diqetîne
7. Agir... Mîrîtiya ku paytexta wê Qeleçolan bû û lê piştre paytextê wê bûye Silêmanî
8. Baneşana kêfxweşiyê... Bajarekî me
9. Kurtkirina gotina televîzyonê... Şivika darîn a zirav a ku serî tûj e û bi kevan tê avêtin... Ji bo bûkê, birayê zavê

### JOR-JÊR

1. Bajarekî me... Peyva neyînî
2. Nexweşiyeke çermî
3. Wext, zeman
4. Encam, netîce... Ew nîjada spî ya ku tê bawerkirin ji kurê Hz. Nûh Sam peyde bûne; wekî kesê ku bi erebî, îbranî, asûrî û hebeşî diaxivin
5. Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji hêla Yezdan ve hatiye tunekirin... Pirtûka pîroz a ku tê bawerkirin ji Hz Dawid re hatiye şandin
6. Bi soranî ‘av’... Kesê ku li ber aş dimîne û karê hêrandina aşî dike
7. Dijbera germ... Xwarina sereke
8. Bajarekî me ku bi sûrên xwe navdar e... Notayek

## Xalid Berkel: Rêveberiya Xweser riya rizgarkirina gelên Sûriyê ji krîzê ye

Xalid Berkel da xuyakirin ku Rêveberiya Xweser riya rizgarkirina gelên Sûriyê ji krîzê ye û got, rejîma Şamê bi zihniyeta xwe ya inkarkirin û dûrxistinê nikare ti çareseriyan bîne. R-5



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 962 11-Gulan- 2022 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

## “Hevpeymana Civakî xelasiya gelan û çareseriya aloziya Sûriyê ye”

Endama Meclisa Rêveber ya Kantona Hesekê Bêrîvan Ismaîl da zanîn ku Hevpeymana Civakî derbasî qonaxa herî girîng bûye û got, hevpeymana Civakî wekheviya gelan û parastina mafê her kesî ye.” R-6



# `Tirkiye dixwaze Başûr bike wilayeteke xwe`

Hevseroka Konseya Rêveber ya KCK’ê Besê Hozat daxuyaniya Mesrûr Barzanî ku gotibû ‘Iraq dikare bibe konfederasyonek ji gelek dewletan ku parçe bûye’, wek hewldana qutkirina Başûr ji Iraqê û girêdana wê wek wîlayetekê bi Tirkiyeyê ve nirxand. R-4



## “Mêr ji bo jinan ji mafên wan bêpar bihêlin şantajê wekî çek bi kar tînin”

Parêzer Zeyneb Ebû Talib teqez kir ku diyardeya “zora li ser jinan” di van demên dawî de di gelek têkiliyên giştî de belav bûye û da zanîn ku guhertin demeke dirêj dixwaze heta ku bandorê li nêrîna civakê ya li ser jinan bike. R-3



## ‘Em êrişên li dijî gerîla qebûl nakin ‘

Li dijî êrişên dagîrkeriya tirkî yên ser Herêmên Paratinê yên Medya û hevkariya PDK`ê jinên rojavayê Kurdistanê gotin, gerîla zarokên me ne, emê li pişt zarokên xwe bin û em bang li PDK’ê dikin ku dev ji hevkariya xwe ya bi dijminê gelê Kurd re berde. R-3

## Celal Zenatî: Dem hatiye ku gelên herêmê li hemberî zêdegaviyên Tirkiyê bibin yek

Celal Zenatî diyar kir ku gelên herêmê ji ber mûdaxeleyên derve gelek êş kişandine û got, dem hatiye ku gelên herêmê li hemberî zêdegaviyên dewleta Tirkan û partiya wî bibin yek. R-5



## ‘Dema wêneyan çêdikim trawmayê his nakim’

Mustafa Azimitabar ku ji ber zordestiya Îranê reviya, di pêşbirka wêneyan ya herî navdar ya Awustralya de bû fînalîst. Azimitabar da zanîn ku dema bihîst bûye fînalîst, gelekî şa bûye.R-7



## PJAK’ê şehîdên 9’ê Gulanê bîr anîn

Partiya Jiyana Azad ya Kurdistanê (PJAK) Şehîdên Sêdarê bi bîr anîn û ragihand ku 9’ê Gulanê sembola têkoşîna pîroz ya gelê Kurd e û şehîdên Sêdarê meha Gulanê kirin meha têkoşîn û bingehê jiyana azad ya Kurdistanê. R-2

**Nameyek ji bo rûspî û rêberên Kurdan**
Sîpan Şînda
*R-7*




**Faşîzma tirkî li Sûriyê plana dagîrkeriyeke nû dike**
Zekî BEDRAN
*R-5*



**Gavên wî yên dawî ne!**
Dilyar Cizîrî
*R-6*



**Girîngiya meha Gulanê**
Ahmet AKTAŞ
*R-4*



## Ev şerê Kurdan hemûyan e!

Kurt û Kurmancî, şer bi her awayî didome, divê em jî bi her awayî; siyasî, hunerî û zanyarî ango bi awayekî rojane û di warê dijîtal de jî derewên dijminên xwe eşkere bikin. Li ber xwe bidin û êrişên diz û dagîrkerên xwe pûç bikin. R-7



# PJAK'ê şehîdên 9'ê Gulanê bîr anîn

Partiya Jiyana Azad ya Kurdistanê (PJAK) Şehîdên Sêdarê bi bîr anîn û ragihand ku 9'ê Gulanê sembola têkoşîna pîroz ya gelê Kurd e û şehidên Sêdarê meha Gulanê kirin meha têkoşîn û bingehê jiyana azad ya Kurdistanê.

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**



Rejima Îranê di 9'ê Gulana 2010'an de çar têkoşer û şoreşgerên gelê Kurd li gel şoreşgerekî Îranî yên bi navê; Şîrîn Elemhulî, Ferzad Kemanger, Ferhad Wekîlî, Elî Heyderyan û Mehdî Îslamyan, li girtîgeha Evîn a Tehranê darve kirin. Partiya Jiyana Azad a Kurdistan PJAK'ê bi daxuyaniyekê Şehîdên Sêdarê bîr anîn.
Daxuyanî wiha ye:
"Şehîdên 9'ê Gulanê bi têkoşîna xwe di dîroka têkoşîna gelê me yê Rojhilatê Kurdistanê de laperên zêrîn nivîsandin. Em Şehîdên Sêdarê bi rêzdarî bibîrtinin soza şopandina doza wa ji bo gel didin.
Ferzad Kemanger, Şîrîn Elemhulî, Elî Heyderyan û Ferhad Wekîlî, sembola têkoşîna pîroz ya gelê Kurd û têkoşîna fedayî ya hêzên gerîla bûn. Şehîdan ji bo azadî û demokrasiyê, ezmanê rejîma zalim ya Îranê hejand.
Mamostayê jiyanê, Ferza Kemanger û hevalên wî, şêweyê berxwedana li hemberî rejîma Îranê, nîşanî gelên Îran û Rojhilatê Kurdistanê dan. Bi xwe jî bi fedayî di vê rêyê de têkoşiyan, berxwedana bê wêne ya Şîrîn Elemhulî ya dijî sîstema Îranê ya li dijberî jinan, bu meşaleya ronahiyê ji bo hemû girtiyên azadîxwaz. Wan gotin, radestbûna li hemberî faşîzmê tê wateya mirinê. Eger îro em dibînin di asta Îranê de gurzek mezin li rewabûna sîstem û rejîmê tê dayîn, ev ji ber rêya rast ya têkoşerên 9'ê Gulanê ye. Kemanger û hevalên wê, meha Gulanê kirin meha heq û azadî, meha têkoşîn û bingeha jiyana azad ya Kurdistanê. Bi fedakirina canê xwe, azadiya gelan mîsoger kirin. Wan bi hêza xwe girtîgehê ji cihê kuştinê vegerandin cihê têkoşînê.
Em bang li hemû azadîxwazin dikin, bi bilindkirina asta têkoşîna azadîxwazan, rêya rizgarî ya gelan bigrin ber xwe. Îro kampanyaya 'Na ji bo sêdare, belê ji bo demokrasî' li Îran û Rojhilatê Kurdistanê destkeftiya şehîdên 9'ê Gulanê ye. Em soza xwe dubare dikin, heya daxwazên şehîdan pêkbên, emê têbikoşin."

## HPG: 11 dagîrkerên artêşa tirkî hatin cezakirin

**Navenda Nûçeyan**



HPG'ê 8`ê Gulanê bi daxuyaniyeke nivîskî ragihand ku li herêmên Avaşîn, Zap û Xakurkê di çalakiyên gerîlayan de, 11 dagîrkerên artêşa tirkî hatine cezakirin û derb li 2 helîkopteran hatiye xistin.
Daxuyaniya Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê wiha ye:
""Di encama çalakiyên tîmên me yên gerîlla yên bi tevger ku bi ruhê milîtaniya Apoyî li dagirkeran xistine û taktîkên gerîla bi bandor bikar anîne de, 11 dagirker hatine cezakirin, 2 dagirker birîndar bûne, çeperek hatiye rûxandin û derb li 2 helîkopterên Skorsky hatiye xistin.
Agahiyên têkildarê çalakiyên hatinî lidarxistin bi vî rengî ye:
1. Li herêma Avaşînê;
– Di 28 û 29'ê Nîsanê de helîkopterên artêşa Tirk a dagirker ên li herêma Şûkê bi çalakiyên koordînekirî ji aliyê hêzên me ve bûne hedef. Di encama lêdanên bi bandor ên hêzên me de 2 helîkopterên skorsky hatin derbkirin. Dîsa di 27 û 30'ê Nîsanê de hêzên me destwerdan li helîkopterên êrîşê ya ku xwest herêmê bombebaran bike, kirin û ew helîkopterên êrîşê neçar man ji qadê derkevin.
– 7'ê Gulanê saet 12:00'an du çeperên dagirkeran ên li derdora çeperên şer ên Qada Berxwedanê ya Werxelê ji aliyê hêzên me ve hatin hedefgirtin û ji nêz ve derbên giran li wan xistin. Di encama lêdanên bi bandor ên hêzên me de 3 dagirker hatin cezakirin, çeperek hate rûxandin û çeperek jî hate derbkirin.
2. Li herêma Zapê;
– 6'ê Gulanê saet 12:30'an de, dagirkerên li derdora çeperên şer ên Kevirêkun ên Qada Berxwedanê ya Şikefta Birîndara bûn, hêzên me yên YJA Starê ve bi taktîka sûîqestê li wan da. Di encama vê çalakiyê de 1 dagirker hate cezakirin.
– Di 7'ê Gulanê saet 08:40'an de, dagirkerên li derdora çeperên şer ên Kevirêkun ên Qada Berxwedanê ya Şikefta Birîndara ji aliyê hêzên me ve hatin kontrolkirin û ji du aliyan ve hedef hatin girtin. Baskê yekem ê çalakiyê; bi bombeyên destan û çekên ferdî bi taktîka vedizînê (sizma) li dagirkeran xistin û 3 dagirker ceza kirin. Baskê duyem ê çalakiyê; dagirkerên di nava tevgerê de bûn hedef girtin û 1 dagirker birîndar kirin. Di heman rojê de saet di 11.30'an de bi taktîka sûîqestê dagirker hatin hedefgirtin û careke din li wan hat xistin û 1 dagirker hate cezakirin. Di encama vê çalakiya ku tîmên me yên gerîlla yên bi tevger bi taktîkên vedizînê, êrîş û sûîqestê pêk anîne, 4 dagirker hatine cezakirin û dagirkerek jî birîndar bûye.
– Di 7'ê Gulanê saet 16:00'an de hêzên me li dijî dagirkerên li derdora çeperên şer ên Girê Ortê yên Qada Berxwedanê ya Karker çalakiyeke koordînekirî ya gerîla lidarxistine. Di encama vê çalakiyê de 1 dagirker hat cezakirin û 1 jî birîndar bû.
– Di 7'ê Gulanê saet 22.00'an de hêzên me ve bi çekên giran li dagirkerên li derdora çeperên şer ên li Qada Berxwedanê ya Şehîd Şahîn xistin. Hedefên ku di encama vê çalakiyê de hatin tespîtkirin bi awayekî serketî li wan hatin xistin.
3. Li herêma Xakurkê;
– Di 7'ê Gulanê saet 18:20'an de dagirkerên li Girê Şehîd Axîn ji aliyê hêzên me ve bi çekên giran hatin hedefgirtin. Di encama lêdanên bi bandor ên hêzên me de 2 dagirker hatin cezakirin.
4. Artêşa Tirk a dagirker 12 caran bi balafirên şer û bi dehan obusan Herêmên Parastinê yên Medyayê bombe kir. Agahiyên derbarê êrişan de wiha ne:
– Di navbera 6 û 7'ê Gulanê de herêma Girê Ortê ya girêdayî herêma Metîna û derdora gundên Hirorê, Deşîşê û Êdinê ji qereqolên li ser xeta sînor bi obus û çekên giran hatin bombekirin. Di 7'ê Gulanê de herêma Girê Ortê 2 caran ji aliyê balafirên şer ve hate bombekirin.
– 7'ê Gulanê saet 19:10'an Girê Cûdî yê herêma Zapê 3 caran ji aliyê balafirên şer ve hatiye bombekirin.
– 7'ê Gulanê saet 13:30'an derdora Ava Lolan a herêma Xakurkê bi balafirên şer hatiye bombebaran kirin.
– Di 7'ê Gulanê de qada Çemço ya herêma Zapê, ji qereqolên li ser xeta sînor bi obus û çekên giran ve hate bombekirin. Di 8'ê Gulanê de qadên Karker û Saca 5 caran bi balafirên şer hatin bombekirin.
– 8'ê Gulanê saet 06:45'an quntarên Girê Zengil ê herêma Garê bi balafirên şer hat bombebaran kirin."

## QSD: Serçeteyekî DAIŞ'ê û 2 hevkarên wî hatin girtin



**Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) ragihand ku Yekîneyên Antî-Teror yên girêdayî QSD`ê li bajarê Reqayê serçeteyekî DAIŞ'ê û 2 hevkarên wî girtin.**

Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) li ser malpera xwe ya fermî ragihand ku Yekîneyên Antî-Teror (YAT) bi ser mala ku serçeteyekî çeteyên DAIŞ'ê xwe lê vedişartî girt û bi serçeteyê DAIŞ`ê re belge û miqdareke çekên pê re desteser kir in. QSD`ê her wiha ragihand ku 2 çeteyên herêmî yên hevkarî bi wî serçeteyê DAIŞ`ê re dikirin jî hatin girtin.



# Ev şerê Kurdan hemûyan e!

Kurt û Kurmancî, şer bi her awayî didome, divê em jî bi her awayî; siyasî, hunerî û zanyarî ango bi awayekî rojane û di warê dijîtal de jî derewên dijminên xwe eşkere bikin. Li ber xwe bidin û êrişên diz û dagîrkerên xwe pûç bikin.

**BERRÎ ŞEMDÎN**

Ferzende Beg, ji Melazgirê, ji eşîrê Heyderan e. Sala 1925'an, weke kesekî çalak di serhildana Şêx Seîd de cih girtiye. Yanî yek ji pêşeng û lehengên serhildanê ye. Bi hevjîna xwe Besra, keça xwe ya 7 salî Elfesiya û dayika xwe ya bi navê Asya re tevî şer dibe û di vî şerî de bi malbatî li ber xwe didin. Li hemberî artêşa Tirk a wê demê, têdikoşin. Ev têkoşîna wan dibe kilam û li ser zimanê dengbêjan digere. Li gorî kilamên dengbêjan dema di şer de zora Ferzende Beg dibin û ew dikeve, hevjîna wî Besra çeka wî li erdê nahêle, wê çekê ji erdê radike û ji devê Besrayê em van gotinan dibihîsin;
"....
Ji êvara Xwedê de teyrê ecelê
Li ser serê me Kurdan re digerîne
Ev ne şerê Hesenan e
Ne şerê Heyderan e
Ne şerê Cibiran e
Ne şerê Sînikan e
Ne şerê duwazdeh bavê eşîran e
..."
Ev şerê Kurdan hemûyan e...
Mîna beriya bi 97 salan, îro jî dîsa heman dijmin êrişê dibe ser axa Kurdan. Ev ne şerê partîyan e, ev şerê Kurdan hemûyan e. Dijmin êrişî Kurdistanê dike. Ev ne şerê PKK û ne jî yê PDK'ê ye! Dagirkerên Kurdistanê berê jî êrişî êl û eşîrên Kurd ên xurt dikirin, dema şer dikirin, tenê ne bi eşîrekê re her wiha bi eşîrên Kurd yên xurt hemûyan re şer dikirin; yanî bi wan eşîrên ew ditirsandin hemûyan re şer dikirin. Li kuderê Kurdekî serî netewandî hebûya, bi artêş û kîmyabaranên xwe êriş dikirin. Çi ji destê wan dihat, texsîr nedikirin û dixwestin tovên Kurdan biqelînin.

### Kurdên serhildêr naxwazin

Yanî şerê berê, tenê ne ji bo eşîra Hesenan û Heyderan bû, weke ku îro ne ji ber eşîra Barzaniyan e. Her wiha ne şerê herêmekê; Behdînan, Serhed, Şemzînan û Zaxo ye jî! Îro jî bi heman hişmendiyê êrişî temamê milkê Kurdan dikin. Ji Serhedê heta Anatoliya Navîn û metropolên Tirkan, li kuderê Kurdên serhildêr hebin û dengên xwe bilind bikin, dixwazin wan tine bikin. Yên tine nakin jî dîl digirin û diavêjin hepsan.

### Divê em ji dîrokê dersan bigirin

Dîsa bi heman hişmendiyê dewleta Tirk li Başûrê Kurdistanê êrişî Tevgera Azadiyê dike. Dewlet li kuderê hêzeke xurt, partiyeke xurt û herêmeke xurt bibîne, dixwaze vê hêzê ji holê rake. Ji lewma, divê Kurd baş bi vê yekê zanibin ku ev şer ji partî, hêrêm û bîrdoziyan bêhtir, şerê tinekirina Kurd û Kurdistanê ye. Hewce ye em ji dîroka xwe hin dersan bigirin, berê jî hin eşîr û axayên bi hêz bi dewletê re dibûn yek û êrişî Kurdan dikirin. Lê paşê dewleta Tirk ev eşîr û axa, yan dikuştin yan jî dişandin sirgûnê. Yanî her tim ew ji bo berjewendiyên xwe bi kar anîne.



### Keç û xortan nexin nav lepê dijimin

Di dema me ya îro de êdî gelê Kurd hay ji her tiştî heye. Li kuderî çi diqewime, dibihîse. Bila kes ranebe ji bo berjewendiyên xwe xelk û axa Kurdistanê binpê neke. Asayîşa herêmê dest danî ser 1200 maskeyên xazê, vê yekê dilê me Kurdan hemûyan êşand. Me hemûyan şerm kir û rûmeta me kete bin lingan. Heqê ti kesî tineye gelê Kurd piçûk bibîne, heqê ti kesî tineye keç û xortên Kurdan têxe nav lepê dijimin. Heqê ti partî û hizbê tineye milletê Kurd bike qurbana berjewendiyên xwe. Ev yek bi ti awayî nayê qebûlkirin! Ji ber peyveke giran e, ez naxwazim bibêjim xiyanet, lê bila kes van tiştên ku nayên gotin û kirin, neke. Heyfa xelkê ku bi salan e li ber xwe dide. Ev xelk li her derê dinyayê hêvî dike ku Kurdistan rojekê serbixwe û azad bibe.
Bi kurtasî şer bi her awayî didome, divê em jî bi her awayî; siyasî, hunerî û zanyarî ango bi awayekî rojane û di warê dijîtal de jî derewên dijminên xwe eşkere bikin. Li ber xwe bidin û êrişên diz û dagirkerên xwe pûç bikin.
Em dîsa vegerin kilama "Ferzende Beg" û nivîsa xwe bi dawî bikin. Di cihekî kilamê de dayika Ferzende Beg, Asiya wiha behsa lehengiya Besrayê ango hevjîna Ferzende Begê dike:
"Hela bala xwe bidin diya Elfesyayê
[Besra]
Ketiye nava şerê giran
Wekî şêran tol distîne
Wele tu şêr î, qîza şêran î
Lêxe, diya min bî, lêxe
Şêr li her derî şêr e
Çi jin e, çi mêr e."
***Ozgûr Polîtîka***

## 'Dema wêneyan çêdikim trawmayê his nakim'

**Mustafa Azimitabar ku ji ber zordestiya Îranê reviya, di pêşbirka wêneyan ya herî navdar ya Awustralya de bû fînalîst. Azimitabar da zanîn ku dema bihîst bûye fînalîst, gelekî şa bûye.**
Mustafa Azimitabar (Mistefa Ezîmîteber) ê ji Rojhilatê Kurdistanê ku li kampeke penaberan a li Awustralyayê 8 salan hate hiştin, bi otoportreya xwe ya ku bi firçeya diranan çêkir, di pêşbirka xelatan a herî navdar a vî welatî ya bi navê Archibal de bû fînalîst.
Mustafa Azimitabar ji ber zextên Îranê reviya, di pêşbirka wêneyan a herî navdar a Awustralyayê de bû fînalîst. Azimitabar da zanîn ku dema bihîst bûye fînalîst, gelekî şa bûye.
Azimitabar sala 2014'an dema ku li kampa penaberan a Awustralyayê ya li Girava Manûs a Papûa Gîneya Nû tê bicihkirin, bi firçeya diranan dest bi çêkirina wêneyan dike. Li gorî gotinên Azimitabar, gardiyanan boyax nedaye wî bi hinceta ku dikare daqurtîne û zerarê bide xwe. Li ser vê yekê, bala Azimitabar diçe ser qehwe û firçeyeke diranan. Penaberê Kurd dibêje, "Ez nizanim bê çi bû... Kêliyeke gelekî taybet bû. Min rahişt firçeya diranan, xist nava qehweyê û li ser kaxizê gerand" û ew kêlî weke "serketinê" pênase kir.
Azimitabar koda 'KNS088' ku 8 salan lê hatibû kirin, kir navê otoportreya xwe. Penaberê Kurd diyar kir ku bi rêya vî karî, wî xwestiye 'êş û hêza' jiyana penaberiyê raxe pêş çavan. Azimitabar got, "Huner û wêne kir ku xurt bimînim û dewam bikim. Ji ber ku dema wêne çêdikim êdî trawmayê hîs nakim."
Penaberê Kurd di 21'ê Çileyê 2021'ê de bêyî îzahek jê re bê kirin, hate berdan û li Awustralyayê hewl dide jiyana xwe ji nû ve ava bike.
Azimitabar diyar dike ku ji bo rêxistineke mirovî weke dilxwaz dixebite.
Serketiyê Xelata Archibald ku wê 100 hezar dolarê Awustralyayê (68 hezar Euro) bistîne wê 13'ê Gulanê bê eşkerekirin.
***ANF/MELBOOURNE***

## Li Rojava rewşa kovarên wêjeyî

**Di Gulanê de li ser navê rojnameyê, dilê me heye em rewşa kovargeriya Kurdî ya îro û bandora kovara Hawarê ya li ser çand û wêjêya Kurdî binirxînin.**
**ARDÎN DÎREN**
Di Gulanê de li ser navê rojnameyê me, dilê me heye em rewşa kovargeriya Kurdî ya îro û bandora kovara Hawarê ya li ser çand û wêjêya Kurdî binirxînin. Ji lewma jî heta ji destê me were, em ê xwe bigihînin kovarên Kurdî û ji wan nirxandinan bigirin.
Nirxandina destpêkê ji kovara "Şermola" ya ku bi Kurdî û Erebî li Rojava derdikeve, hat ber destê me. Dilşad Murad weke rêvebir û sernivîskarê kovarê, rewşa kovarên wêjeyî ya li Rojava û bakûr rojhilatê Sûriyê nirxand.
Dikarin bandorê bikin
Nirxandina Dilşad Murad wiha ye;
"Kovarên wêjeyî yek ji cureyên girîng ên weşanên medyayî ye û di vejandina rewşa wêjeyî û çandî ya her welatekî de xwedî girîngiyeke mezin e, nemaze ku di warê ramanî û afirîneriya wêjeyî de xwedî bandorên kalîte be.
Kovarên wêjeyî yên Kurdî di hembêzkirina pênûsên nivîskaran de û di derxistina gengeşeyên li ser mijarên wêjeyî û çandî de roleke berbiçav hene û rola wan di tevlihevkirin û pêwendiya çandên herêmê û belavkirina çanda herêmî li derve jî heye.
Rewşa giştî ya kovarên Kurdî li Rojava û bakurê rojhilatê Sûriyê li gorî dezgehên ragihandinê ne xirab e, ji ber ku ew zêdetir komên xwende û nivîskaran hembêz dikin, her çend di karê xwe de pêdiviya wan bi pêşveçûnê heye.
Kovarên ku bi sazî û rêxistinên yekîtiyên nivîskar û rewşenbîran ve girêdayî ne ji rêxistinbûna nebaş û derengmayîna hejmarê dikevin. Ji ber ku di nava wan yekîtiyan de nakokî û meseleyên rêxistinî û qelsî bandor li wê kir du kovar hene ku organîzetir têne dîtin: Şermola û Sîwan (Herdu kovarên wêjeyî ne) û kovara Rojhilata Navîn a Demokratîk (kovareke siyasî ye).
Wek nimûne kovarên wêjeyî, Kovara ´Şermola´, a serbixwe û demsalî ye, ji roja derketina hejmara xwe ya yekem di Sibata 2019'an û vir ve, hejmarên wê bi awayekî periyodîk û di dema xwe de derketine. Rêxistina redaksiyonê, berdewamî û hejmareke zêde ya nivîskarên ku tê de beşdar dibin. Heta destpêka sala 2022'yan sêzdeh hejmarên wê hatin çapkirin û hejmara nivîskarên wê gihişte nêzîkî 300 nivîskarên ji Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Kurdistan, welatên Ereb û Ewrûpayê. Kovarên îroyîn negihiştine wê asta kovara Hawarê ku karibe rasterast bandorê li ziman û çanda Kurdî û bi giştî tevgera Kurdî bike. Ji ber vê yekê, divê em xebatên xwe zêdetir bi pêş bixin da ku bigihêjin astekê ku bikaribe di avakirina siyaset û meylên wêjeyî û çandî yên Kurdî de bi rola xwe rabe û xwe bike wek dibistanên wêjeyî."
***Ozgûr Polîtîka***



## Nameyek ji bo rûspî û rêberên Kurdan

**Sîpan Şînda**

Gelî rûspî û rêberên Kurdan yên hêja û qedirbilind, ez vê nameyê ji we re dinivîsim ji ber ku hinek dem hene divê rêber û rûspî di wan deman de rola xwe bilîzin û peywira xwe ya rûspîtiyê û rêberiyê pêk bînin. Îro tam ew roj e ku hûn destê xwe bidin hev û dengê xwe bilind bikin. Ez li vir qala dîroka Kurdistanê ji we re nakim. Ez qala girîngî û xurtbûna çanda Kurdî ji nakim. Herwiha ez ti ajîtasyonan ji nakim. Ez dixwazim tiştekê tenê bînime bîra we: Peywira we! Belê peywirek li ser milê we ye û îro roja wê ye ku hûn wê peywira xwe pêk bînin. Ka ji kerema xwe re du deqîqeyan guhdarî xulamê xwe bikin.

Ezbenî, eve sed sal in li Kurdistanê şerê man û nemanê tê kirin. Bi dehan serhildan li hemberî çar dewletên dagîrkerên welatê me çêbûne, lê mixabin ji ber ku welatê me çar parçe ye û yekîtiya me nîne, hê me nikariye ti mafî bi dest xwe ve bînin ji xeynî nîvdewletiya li Başûr. Weke hûn dizanin, neyarên me ne yek in. Ew her çend neyarên hev in jî, bes dema mijar dibe Kurd ew birayên hev in. Ji ber wê gelek caran ew neyarên hov bûne sedem ku Kurdan birakujî di nava xwe de kiriye. Van neyarên Kurdan fesadî û ewanî di nava Kurdan de kirine û berdane he. Kurdan di nava tixûbê kîjan ji van çar dewletan de serhildanek kiribe her siyên din jî alîkarî dane dewleta din û serhildan tefisandine û Kurd kuştine. Îro jî heman tiştê dikin. Ji ber ku firşikê wan ji fesadiyê ye. Ji ber ku ew dizanin ji bo wan tişta herî baş bêtifaqiya Kurdan e. Ez dizanime çêkirina yekîtiya Kurdan îro ji çûna feqîrekî ya li ser esmanê heftan zehmettir e. Lê ka werin ji kerema xwe re hema hewl bidin bila Kurd şerê biratiyê nekin. Ka werin nehêlin mam û birazî, xal û xwarzî, pismam û dotmam di çeperan de rûnin û terman ji hev bêxin.

Gelî hêjayan, ez dizanime ez daxwaziyeke "mezin" ji we dikim. Lê ji kerema xwe re vî xulamê xwe neşkînin û zend û bendên xwe hildin û bikevin nava liv û tevgerê. Li hev kom bibin û herin xwe bavêjine mala serokên partiyên Kurdan û ji mala wan ranebin. Heke ew deriyê xwe ji we re venekin, hûn ji ber deriyê wan newin û li ber deriyê wan rûnin. Li wê derê têhn û birçî bimînin lê dîsa jî ji ber deriyê wan ranebin. Bila berevanên xwe rêkin û hewl bidin bi darê zorê we ji wê derê rakin lê dîsa jî ranebin. Bila xeber û dijûnan bidin we, bila li we bidin lê dîsa ranebin û daxwaziya xwe ji wan re bêjin. Ji wir ranebin heta ku daxwaziya we pêk bînin. Ji wan re bêjin gelê Kurd ne hewceyî nan û ava we ye. Gelê Kurd hewceyî biratiyê ye û gel naxwaze zarokên wan hev bikujin. Gelê Kurd dixwaze bi hev re di nava aştiyê de bijî û naxwaze neyartiya hev bike. Ji wan re bêjin tenê armancek ya hemû Kurdan heye; azadiya Kurd û Kurdistanê. Ev sed sal in hemû Kurd ji bo vê armancê şerî dikin û bi vê xiyalê dijîn. Herwiha ji wan re bêjin her çar parçeyên Kurdistanê ya her Kurdî ye û Kurdek nikare birayê xwe ji mala xwe derxe.

# “Hevpeymana Civakî xelasiya gelan û çareseriya aloziya Sûriyê ye”

Endama Meclisa Rêveber ya Kantona Hesekê Bêrîvan Ismaîl da zanîn ku Hevpeymana Civakî derbasî qonaxa herî girîng bûye û got, hevpeymana Civakî wekheviya gelan û parastina mafê her kesî ye.”

**RONÎDA HACÎ**

Hesekê-Li gorî pêvajoya heyî û destkeftiyên ku bi hevgirtina gelên herêmê hatiye bidestxistin Rêveberiya Xweser pêwîstî bi çêkirina Hevpeymanek Civakî dît. Li Bakûr û Rojhilatê Sûriyeyê gelek pêkhate dijîn Kurd, Ereb, Aşûr, Suryan, Ermen, Kildan, Çaçan û Êzidî. Hevpeymana Civakî ji bo parastina mafê her pêkhateyê derbasî qonaxa herî girîng bû. Di qonaxa sêyemîn de bi sazî, meclis, komîn, eşîran re nîqaş li ser bendên wê tê kirin. Endama Meclisa Rêveber a Kantona Hesekê Bêrîvan Îsmayîl axivî.



**“Hevpeymana Civakî sîstema demokratîk parastina ekelojî û azadiya jinan esas digre”**

Bêrîvan Îsmayîl da zanîn ku Hevpeymana Civakî sê xalên girîng esas digre û wiha anî ziman: “Li Bakûr û Rojhilatê Sûriyeyê gelek pêkhate dijîn, ji destpêka şoreşê ve heya roja îro gavên girîng hatin avêtin û ji bo parastina nirxên şoreşê Rêveberiya Xweser pêwîstî bi Heveymana Civakî dît. Hevpeymana Civakî sê xalên girîng bîngeh digre. Yek jê sîstema demokratîk ku mafê her pêkhateyê hebe xwedî li nirx, ziman, ol û çanda xwe derkeve. Ya duyem sîstema ekolojîk her kes xwedî li ekolojiyê derkeve ji ber ku em nikarin xwe ji xwezayê cuda bibînin, em beşek jê ne lewma parastina wê û paqijî pir girîng e û bi nêzîkbûna bi wê re şaristanî û çanda mirovan diyar dibe. Bi vê yekê mirov dikare xwe û civaka xwe ji nexweşiyan biparêze. Xala girîngtirîn azadiya jinan mafê bingehîn e di hevpeymana civakî de. Ji ber ku gihandina vê pêvajoyê ne bi hêsanî hatiye bi pêşengiya jinên azad çêbûye. Civaka azad û wekhev bi azadiya jinan tê avakirin, dema jin azad bibe û sîstema hevjiyana azad were avakirin dê hemû pirsgirêkên civakê werin çareserkirin.”

**“Serkeftina Hevpeymana Civakî destgirtina wekheviya di navbera jin û mêr de ye”**

Bêrîvan Îsmayil bal kişand ser rola jinan di peymanê de û da zanîn ku ji sedî 50 cih digrin loma nîşaneya serkeftina hevpeymanê ji vê xalê diyar e û wiha axaftina xwe domand: “Di vê pêvajoya hesas de ku cîhan tevliheviyek mezin dijî, bandora wê li ser Bakûr û rojhilatê Sûriyeyê jî heye. Hevpeymana Civakî girîng e di vê qonaxê de were pêkanîn. Cara yekem di dîrokê de jin ji sedî 50 cihê xwe di Hevpeymana Civakî de digrin, ev yek pir girîng û bi wate ye. Jin xwedî roleke pir girîng in di civakê de. Em ji malbata demokratîk bigrin heya civaka demokratîk jin pêşeng in û roleke girîng dilîzin. Dayîna vê hejmarê serkeftina hevpeymana civakî diyar dike. Hevpeyman wekheviya herdu cinsan esas digre, bi vê yekê wê rê li ber hemû pirsgirêkên civakî were girtin û civakek exlaqî û polîtîk were avakirin.”

Bêrîvan Îsmayîl behsa bendên Hevpeymanê kir û got: “Sîstema kar û xebatê dê were guhertin dê bibe komîn, meclisên taxan, bajarok, meclisên bajar û Kantona Cizîrê. Di Hevpeymana Civakî de gelek bend hene, hemû qadên civakî esas girtine edalet, ekelojî, aboriya civakî, mafên jinan û her wekî din. Edalet tê wateya ku her kes wekhev be û mafê wan were dayîn. Ekelojî tê wateya parastina xweza, teduristiya mirov û şaristaniyê, aboriya civakî ku herî zêde bi riya civakê be wekî sîstema kooperatîfan were pêşxistin û mafên jinan di sîstema hevserokatiyê de, dayîna nerîn û biryar be û wekheviya herdu cinsan esas were girtin. Piştî ku jinan di şoreşa rojava gavên herî girîng avêt di hevpeymana civakî de bendên taybet ên girêdayî jinan çêbûn. Wekî Edaleta Civakî ya jinan di hundirê xwe de Mala Jin, Komîteyên Lihevanînê, Dîwana Edaletê û Meclisa Edaleta Jin dihewîne. Armanca wê ew e ku beriya pirsgirêk derkeve çareserî were dîtin ew jî bi riya perwerdekirina komîn, meclis û hemû civakê pêk tê. Dema em doza mafekî dikin bêguman erk jî heye pêwîst e em erkên xwe pêk bînin da ku em bikarin mafê xwe bi dest bixin.”

**“Hevpeymana Civakî wê li pêş hêzên desthilatdar bibe bend”**

Bêrîvan Îsmayîl wiha dawî li axaftina xwe anî: “Hevpeymana Civakî bi taybetî xelasiya gelê Bakûr û Rojhilatê Sûriyeyê ye û tevahî Sûriyeyê ye. Bendên di Hevpeymana Civakî de ji bo avakirina Sûriyeya ne navendî ne, ev bend hemû jî bi nêrîna gel hatine nivîsandin. Ji bo wê em wê xelasî û parastina mafê her kesê dibînin. Bêguman wê xeteriyek li ser dewletên desthilatdar û dagirker be. Ji ber ku ne ji berjewendiyên dewletan e ku sîstemek demokratîk were avakirin ango çareserî ji krîza Sûriyeyê re were dîtin.”

*JINHA*



## Gavên wî yên dawî ne!

**Dilyar Cizîrî**

Dewleta Tirkan ya dagîrker ji bo qirkirina gelê Kurd êrişên xwe derxistine asta herî jor. Li başûrê Kurdistanê li dijî herêmên gêrîla ji roja 17’ê nîsanê ve bi hêzeke mezin û bi hevkariya çekdarên PDK’ê êriş dike. Li vir gêrîlayên HPG’ê û YJA-Star bi qehremaniyeke mezin li ber xwe didin û rojane, derbên giran li êrişkaran dixin. Dewleta Tirkan ji bo encamê bigire, çekên kîmyayî jî bi kar tîne û êrişa xwe bi hemû hovîtiyê didomîne.

Di heman demê de êrişên li ser Şingalê ku ji aliyê hikûmeta Iraqê û PDK’ê ve pêk tê, beşek planên dewleta Tirkan e û di heman konseptê têne meşandin. Dixwazin li Şingalê jî hebûna civaka Êzîdî bi dawî bikin û sîstema Rêveberiya Xweser a wê derê bi dawî bikin. Li vir jî Kurdên Êzîdî li dijî planên wan berxwedanek mezin nîşan da û heta niha hemû hewldan û êrişên wan vala derxistin.

Balkêş e, dewleta Tirkan hemwextî wê êrişên xwe yên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê zêde kirine. Em dibînin rojane xetên Til Temir, Zirgan û Şehba têne topbaran kirin. Ne tenê wiha, lê belê vê carê topên wan gihan bajarê Kobanê jî. Li vir jî xelkên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û şervanên wê li dijî Êrişan ber xwe didin û planên wan pûç dikin. Lê dewleta Tirk ji bo planên xwe yên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi cih bîne, niha dixwaze li herêmên dagirkirî mîtîngeriyê pêş bixe. Dixwaze xelkên Sûriyê yên ji herêmên din koçber bûne û li Tirkiyê bi cih bûn li herêmên dagirkirî bi cih bike. Ev jî tê wateya bi cihkirina koçberan li cihekî ne aram. Ya din jî wê xelkê li cihê şêniyên resen bi cih bikin. Ev jî wê rê ji tevliheviyeke demdirêj û şerê navxxweyî re veke.


Balkêşe di hemwextî wê tevgera çeteyên DAIŞ’ê ya vê dawiyê û êrişên wan ên bi navê “Tola ji her dû Şêxan re” ku li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê daye destpêkirin, beşek ji planên dewleta Tirk e. Tişta vê isbat dike jî, belge û mukirhatinên çeteyên ji aliyê QSD’ê ve têne girtin e.

Balkêşe, di heman konsptê de heman demê tecrîda li Îmralî li dijî Rêber APO jî girantir kirine, ev saleke tu agahî jê nayê girtin. Bi hinceta displînê hevdîtina bi parêzeran re tê redkirin. Bi vê jî dixwazin di dema planên xwe pêk tînin, gelê kurd ji rêber Ocalan qut bikin û rê nedin perspektfên Rêbertî bighêjin gelê kurd û tevgera azadiyê.

Ji ber ew dizanin perspektîfên Rêber APO di hemû deman de bûne sedema gavên mezin ji gelê kurd û tevgera azadiyê re. Ew jî her dixwazin rê nedin peyam û perspektîfên Ocalan derkevin. Bi giştî planên dewleta Tirk ên behsa mijarê di çarçoveya berdewama komploya 9’ê Cetmehê ya li dijî Rêber APO de pêk tên, hîn jî rola NATO û Amarîka di planên dewleta Tirk de serkêşiye. lê ji dane û geşedanên di herêmê de diyar dibe, Amarîka û NATO vê carê fersenda dawî dane Erdogan ku plan û projeyên xwe yên tunekirina gelê kurd bi dawî bike. Ji lewma Erdogan hebûna lez daye pêkanîna planên xwe yên qirker.

Lê berxwedan û tekoşîna gelê Kurd li hemû qadên êrişan planên dagirkirinê yên dewleta Tirk têk dibin. Bi rakirina asta berxwedanê wê hikûmeta AKP/MHP’ê muheqeq têk biçe. Ev jî wê bibe destpêka serkeftina mezin a li hemû qadên tekoşînê. Li gorî xuya dike encam wê di sala li pêş me de wê zelal bibe. Bi taybet peymana sedsalê di wê demê de bi dawî dibin û mecbûriyê hêzên hegemon pê heye, peyman û planên nû deynin. Her aliyek jî wê li gorî hêza xwe tê de cih bigre.

# Li Tirkiyê fatûreya polîtîkaya şer: 70 milyar ji bo parastina neteweyî û 200 milyon lîre ji bo dîwarên sînor xerc kirin



Bacên ku ji gel tên komkirin ji bo “ewlekariyê” tên xerckirin. Li gorî daneyên Rapora Çalakiyan a Wezareta Parastinê ya sala 2021’an çend lêçûn wiha ne; “Ji bo ewlekarî û parastina neteweyî 70 milyar, ji bo dîwarên di navbera Sûriye û Îranê de 200 milyon û ji bo çalakiyên TSK’ê yên derveyî welat jî 2 milyar lîre hatine xerckirin.”

Desthilatdariya AKP-MHP’ê bacên ku ji gel kom dike di bin navê “ewlekariyê” de ji bo polîtîkayên xwe yên milîtarîst bi kar tîne. Lêçûnên di Rapora Çalakiyan a Wezareta Parastinê ya sala 2021’an de hatine destnîşankirin, radixe ber çavan bê ka şer li ser aboriyê barekî çiqas mezine. Li gorî vê yekê; ji xizîneyê bo Parastina Neteweyî û Ewlekariyê 60 milyar û 544 milyon û 140 hezar TL hatibûn veqetandin û bi dawiya salê re lêçûnên wê gihişt 69 milyar û 166 milyon û 46 hezar û 455 TL’yan.

**JI BO ÇALAKIYÊN DERVEYÎ WELAT 2 MILYAR TL**

Ji bo çalakiyên TSK’ê yên derveyî welat ku bi navê “Polîtîkaya derve” tên kirin û alîkariyên bi welatên “Dost û şirîk” re, 211 milyon û 507 hezar lîre tahsîsat hatibû kirin lê ev reqem ji sedî 86 zêde bû û derket 2 milyar û 297 milyon û 507 hezar lîreyan. Tê gotin ku fonên di bin navên “Parastin û piştgiriya bi aştiyê re” û “Alîkariya ewlekariyê ya bi welatên dost û şirîk re” tên dayîn, bi Neteweyên Yekbûyî (NY), NATO, Yekitiya Ewropayê (YE), Lubnan, Kosova, Bosna-Hersek, Efxanistan re hatiye kirin.

Di raporê de hat destnîşankirin ku çalakiyên bi Azerbaycan, Efxanistan, Albanya, Bosna Hersek, Gambiya, Gurcistan, Karadag, Qirgizistan, Kosova, Makedonyaya Bakur, Ozbekistan, Somalî, Tûnûs, Turkmenistan û Ûkraynayê re di çarçoveya Peymanên Hevkariya Darayî yên Leşkerî de didomin.

**JI BO DÎWARÊ SER SÎNOR 200 MILYON LÎRE**

Bi domdarî di raporê de balê dikişîne ser dîwarê di navbera Sûriye û Îranê de hatiye çêkirin ku bi mebesta qutkirina têkiliya di navbera kurdan de hatiye çêkirin. Li gorî raporê, ji bo beşa 5,5 kîlomîtroyan a dîwarê li ser sînorê Sûriyeyê ku 911 kîlomîtroyên wê hatiye temamkirin û dîwarê ser sînorê Îranê ku ji 191 km’an di sala 2021’an tenê 45 km jê hatiye çêkirin, 200 milyon TL hatine xerckirin.

**LI SER SÎNOR 284 KAMERAYÊN TERMAL HATIN BICIHKIRIN**

Di raporê de hat gotin ku ji bo li ser sînorê Sûriyeyê bên bicihkirin, daxwaza 284 kamerayên termal hatibû kirin û ji van 153 jê hatine bicihkirin. Tê payîn ku dê yên din jî di sibata 2022’yan de bên temamkirin.

*MA*



# ‘Em êrişên li dijî gerîla qebûl nakin ‘

Li dijî êrişên dagîrkeriya tirkî yên ser Herêmên Paratinê yên Medya û hevkariya PDK`ê jinên rojavayê Kurdistanê gotin, gerîla zarokên me ne, emê li pişt zarokên xwe bin û em bang li PDK’ê dikin ku dev ji hevkariya xwe ya bi dijminê gelê Kurd re berde.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Tirkiye ji ber zihniyeta xwe ya netewperwst ti carî statûya Kurdan qebûl nekiriye. Ji bo wê jî her tim êrişî çavkaniya tekoşina azadiya Kurdan dike. Yek ji van çavkaniyan jî Herêmên Parastina Medyayê ne. Li kêleka van êrişên li ser gerîlayên azadiyê, bê navber êrişê Mexmur, Şengal û bakur û rojhilatê Sûrî dike. Herwiha PDK bi fermî daye diyarkirin ku hevkarê van êrişên dewleta tirk ya dagirker e.

Ji bo şermezarkirina êrişên dewleta tirk ya dagîrker yên li dijî Herêmên Parastina Mediyayê, herwiha hevkarî û xiyaneta PDK`ê Jinên kurd yên Rojavayê Kurdistan nêrînên xwe ji me re anîn ser ziman.

**`Gerîla fikir û felsefeya demokrat e`**

Jina bi navê Sînem Hacî êrişên dagîrkeriya tirk yên ser Gerîla şermezar kir û da zanên ku Gerîla li dijî êrişên dagîrkeriyê bi rihekî



fedayî li ber xwe didin û got, divê em jin û dayîkên jî bi rihî berxwedana gerila tekoşin bikin û li dijî kiryarên hovane bisekinin. Gerîla zarokên me ne, em ti caran êrişên li dijî wan qebûl nakin. Dewleta tirk her tim di êrişên xwe yên li dijî Gerîla de bin ketiye û disa wê bin bikeve. Çimkî gerîla xwedî hêz, fikir û felsefeyeke demokrat e û li ser vî fikrî têkoşînê dike.

**‘Eger hûn Kurd bûna we xwîna Kurdan nedirjand!’**

Sînem behsa xiyaneta PDK`ê û hevkariya wê ya bi dijminê gelê kurd re kir û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Em ji mala barzanî re dibêjin, eger hun kurd bûna we xwîna kurdan nedirjand, we bi dijminê kurdan re hevkarî nedikir. We ji bo kurdan çi kiriye, ji bilî xiyanetê me tiştek ji we nedîtiye. Êdî bes e bazirganiya bi xwîna gelê Kurd re, êdî bes e xiyanetê re.”

Sînem Hacî bang li dayîkên Pêşmerge kir ku zarokên xwe ji xeta xiyanetê dûr bixin. Herwiha got, çekdarên bi navê `pêşmergeyên roj` hûn zarokên Rojavayê Kurdistanê ne, werin Rojava bi Kurdên xwe re şerê dagîrkeran bikin. Werin da hûn bibînin li Rojava çi bi serê Kurdan tê kirin. Li şûna hûn Kurdên xwe bidin kuştin, ji wan re bibin destek, ma hûn şerm nakin!.

Sînem Hacî bal kişand ser yekîtiya kurdan û wiha got: “Ji bo pêşîgirtina li êrişan û çareserkirina pirsgirêkan, pêwîst e yekîtiyek were avakirin. Banga me ji tevayiya siyasetmedar û partiyên siyasî re heye ku pirsgirêka yekîtiya neteweyî çareser bikin, da Kurd



bi hev re mafê xwe pi dest bixin û dagîrkeran ji welatê xwe derxin.”

**`Eger hevkarî nehatibûya kirin Tirkiyê nikarîbû tiştekî bike`**

Jina bi navê Liwense Şawîş jî da zanîn ku ev ne cara yekê ye ku PDK`ê xiyanetê dike û axaftina xwe wiha domand: “PDK`ê ji roj roja xwe de xiyanetê dike. Insanê di bin serweriya dijminê xwe de be, çi jê bê xwestin wê bike. Wek jinên kurd, malbat û hevjînên şehîdan em bang li mala Barzanî dikin, ku ji vê rêya xiyanetê û birakujî yê vegerin. Gerîla zarokên me ne, me wan ji esmanan ne anîne. Gerîla ji bo ku mirovayiyê biparêzin têdikoşin. Bila dewleta tirk baş zanibe heta ku jinek kurd li rûye erdê hebe wê li dijî Tirkiyê şer bike. Ji bo mala barzanî jî em dibêjin, ‘eger we hevkarî nekiriba Tirkiyê nikarîbû tiştek kiriba.’ Gerîla naxwaze birakkujiyê bike, aştî û biratiya gelan dixwaze.”

**“Dem dema helwesta rûmetê ye”**

Liwensa Şawîş di daviya axaftina xwe de got, Armanca êrişan ew ku careke din kurd bê nasname û bê cî û war bimînin. Pêwîste gelê kurd bi yek helwestê li hember planên dagîrkeriyê derkevin û wan vala derxînin. Êdî bese ku dijmin planê xwe bi destê kurdan pêş bixîne, êdî bese ku xwîna kurda bi destê kurda were rijandin. Dem dema helwesta rûmetê ye, yê ku helwesta xwe nede diyarkirin wê di nezera gelê me de were şermezarkirin.

# Mêr ji bo jinan ji mafên wan bêpar bihêlin şantajê wekî çek bi kar tînin

**Parêzer Zeyneb Ebû Talib teqez kir ku diyardeya “zora li ser jinan” di van demên dawî de di gelek têkiliyên giştî de belav bûye û da zanîn ku guhertin demeke dirêj dixwaze heta ku bandorê li nêrîna civakê ya li ser jinan bike.**

Jin di hemû serdeman de ketine kemînên civakê û bûne nêçîr. Çand û nerîna civakî, di gelek waran de bûye qada îstîsmarkirina mêran. Bi wî rengî hewl dane mafên wan di nava tiştên ku derdora wan a civakî qebûl nake de ji wan bistînin. Ev yek bûye sedem ku gelek kes jiyana xwe ji dest bidin ji bo ku ji zexta baviksalarî ya li ser wan hatiye ferzkirin xilas bibin.

Pergala civakê êdî ne wekî bûyerek derbasbûyî yan awarte ye, bûye armancek organîze û bi rêkûpêk armanc dike ku zirarê bide kesan. Çi bi riya şantajên dîjîtal bi riya malperên curbecur ên tora civakî dibe, çi jî bi riya rastiya gefa eşkerekirina tiştên “veşartî.”

**Di bedêla heqdestê jinan de îftîra bi tiştên borî tê kirin**

Yek ji wan çîrokên bi êş a Salma Adel e. Ew diyar dike ku tu sûcê wê di jiyanê de tunebû, ji bilî ku ew beriya zewaca xwe bi xortekî re têkilî dayne. Wî di dema têkiliya wan de komek wêne ji wê girtibû loma malbata wê ew neçar kir ku bi yekî ku ew naxwaze re bizewice.

Salma Adel li ser wê yekê dibêje: “Piştî zewaca min, kesê ku ez pê re têkildar bûm, vegeriya û bi çend wêneyan şantajê li min kir û hevserê min destwerdan kir û dawî li meseleyê anî. Min digot qey ew xeta jiyanê û xilaskarê krîza min e lê ew bû toqa lanetê. Her dema ku ji ber mayîna wî ya li malê nakokî di navbera me de derdiket, berteka wî dijwartir dibû û serpêhatiya min a bi kesê ku berê pê re têkildar bûm dianî ziman, bi gotinên xirab behsa min dikir. Ez rojekê piştî lêdana wî ji malê derketim û çûm mala malbata xwe. Wê demê ew hat bi min re biaxive, ez ecêbmayî mam. Nizanibûm ku kopyayek ji wêneyên kevin li cem wî hebûn û di bin gefê de, min biryar da ku ez vegerim gel wî û heta razî bûm ku ez meaşê xwe yê mehane bi tevahî bidim wî. Bi şertê ku ew lênihêrîna malê bike. Du zarokên min ji wî hene ku ew jî ji ber tiştên ku hatine serê min di tevahiya jiyana wan de dê bên mehkûmkirin ez naxwazim pêşeroja wan wek ku hat serê min be.”

Salma Adel diyar kir ku ew êdî di vê jiyanê de ji bilî mezinkirina du zarokên xwe tiştekî din naxwaze û da zanîn ku qanûn bi wê re ne, eger ragihîne wê li dijî hevserê wê tedbîrên tundiyê bên girtin lê wê nikaribe encamên vê mijarê bigre, bi kêmanî di civaka xwe de.

**“Rêjeya bikaranîna şantaja li ser jinan ji bo bêparkirina mafên wan di demên dawî de zêde bûye”**

Parêzera Dadgeha Bilind û Encûmena Dewletê Zeyneb Ebû Talib got ku stigma bûye yek ji wan diyardeyên ku di van demên dawî de di gelek têkiliyên giştî û hin caran jî yên marjînal de belav bûye û got: “Jixwe gelek doz ji ofîsa wê re hatine ragihandin ku bi taybetî bi vê qeyranê ve girêdayî ne ji ber ku bandora xwe li ser mexdûran ji aliyekî ve û dengvedana wê di civakê de wekî encama çanda wê ya baviksalarî ji hêla din ve heye.


Zeyneb Ebû Talib bal kişand ku hin mêr serî li kampanyaya îftirayê didin û kiryarên xwe ji jinên xwe re vedibêjin ger ew nexwazin zewacê berdewam bikin dê zewaca “ragir” bibe, yan jî wekî “mala weqfê” ku nikare bêyî wî bizewice yan jî berdewam bike ji ber bêexlaqiya wê ya piştî kampanyaya qirêj.”

Zeyneb Ebû Talib yek ji wan çîrokên nebaş vegot ku mêrekî hevjîna xwe reş kir da jiyana xwe bi wî re bidomîne. Piştî ku bi wê re navdar bû, dema jê pirsî li ser bandora qebûlkirina berdewamiya bi wê re û nêrîna civakê ya li ser wê. Piştî ku hevjîna xwe stigmat kir û ew bi xiyanetê tawanbar kir, eşkere kir û got ku ew ê ji derdorên xwe re wekî mexdûr û zilamek dilovan xuya bike û ji bo parastina pêşeroja zarokên xwe û berdewamiya malbata xwe dê wê efû bike.

**Îstîsmarkirina valahiyên qanûnê**

Zeyneb Ebû Talib got ku “îbahet” û cezayê kêm yek ji girîngtirîn valahiyên zagonî ne û teqez kir ku gelek mêr ji van valahiyan sûd digirin da ku jinan ji mafên wan bêpar bikin. Her wiha bal kişand ser bûyerên vê dawiyê ku tê de birayekî dîmenê xwişka xwe tazî kişandiye ku gefan lê bixwe da ku wê ji mîrasê bêpar bike û ew jî dest ji mafên xwe berde. Di heman demê de wêneyê hevjîna xwe di rewşek ne munasib de kişand da ku wê neçar bike dest ji mafên xwe berde di dema daxwaza wê ya hevberdanê de.

Zeyneb Ebû Talib teqez kir ku pêwîst e guhertineke zagonî were kirin da ku dayîna cezayên sivik ango bi navê “îbahet” tê binavkirin sînordar bike. Her wiha ji bo ku nebe hincet ji bo alîkariya sûcdar di dûrketina ji ceza de dadmendî hewce dike ku cezayê ji jinan re wekhev be. Di sûcê zînayê de, cezayê mêr ji yê jinan cudatir e, her çend qanûnên Îslamê di vê mijarê de qet ferq û cudahî nexistibin navbera jin û mêran jî divê ev xalên cudaxwaz ji nû ve bên liberçavgirtin.



**Bandora guhertina çandê ji zagonan bihêztir e**

Gelek jin neçar dimînin tiştê ku naxwazin bikin û tiştê ku wan biryar daye rawestînin berdewam dikin. Tenê ji tirsa wan awirên tund ên ku dê wek tîrên di civakê de li wan bên xistin ger ku mijar bibe heqaret.

Zeyneb Ebû Talib destnîşan kir ku muwekîla wê ji hevserê xwe di nav gel de, piştî îftirakirina wê, hevokek pir xirab a wiha bihîstiye: “Jiyana bi min re ji şermê birehmtir e.” Li vir ew ê venegere gel wî ji ber ku ew dixwaze lê ji bo ku wê ji stemkirin û awirên derdorê biparêze. Piştî ku wî kampanyayek sîstematîk a îftirayê li dijî wê da destpêkirin ku tê de ji aliyê exlaqî ve wê sûcdar kir.

Zeyneb Ebû Talib amaje bi wê yekê kir ku guhertin dê demek dirêj bigre heta ku bandorê li nêrîna civakê ya li ser jinan bike ku her dem wê dûr dixin û ev mijar pêwîstî bi karkirina nifşên ciwan bi riya bernameyên xwendinê yên dibistana seretayî û her wiha di asta malbatê de heye.

*JINHA*

# Besê Hozat: Tirkiye dixwaze Başûr bike wilayetek xwe û Barzaniyan bike waliyê wê

Hevseroka Konseya Rêveber ya KCK'ê Besê Hozat daxuyaniya Mesrûr Barzanî ku gotibû 'Iraq dikare bibe konfederasyonek ji gelek dewletan ku parçe bûye', wek hewldana qutkirina Başûr ji Iraqê û girêdana wê wek wîlayetekê bi Tirkiyeyê re nirxand.



Dewleta Tirk a dagirker bi hevkariya PDK'ê ji 17'ê Nîsanê û vir ve êrişî herêmên Zap, Metîna û Avaşînê yên Başûrê Kurdistanê dike. Di nava 23 rojên derbasbûyî de artêşa Tirk derbên giran xwar. Hevseroka Konseya Rêveber a KCK'ê Besê Hozat li ser van êrişan û hevkariya PDK'ê ya bi dewleta Tirk a dagirker re bersiv da pirsên rojnameya Yenî Ozgur Polîtîkayê.

**PDK û Barzaniyên ku bi navê hikumeta Kurdistanê ya Federe tevdigere, têkiliyên bi Enqereyê re zêde kirin. Li pişt van têkiliyan gelo bazariyeke çawa heye?**

Beriya ku bersivê bidim pirsa we, dixwazim di şexsê şehîdên meha Gulanê de şehîdên şoreşê bi bîr bînim. Ji rêberên mezin ên tevgera şoreşê ya Kurdistanê û Tirkiyeyê Mehmet Karasûngûr û Îbrahîm Bîlgîn di 2'ê Gulanê de, Denîz Gezmîş, Yûsûf Înan û Huseyîn Înan 6'ê Gulanê, Hakî Karer, Çaran û Îbrahîm Kaypakkaya di 18'ê Gulanê de şehîd bûn. Di şexsê van şoreşgerên mezin şehîdên azadiyê û şoreşê hemûyan bi rêzdarî, hezkirin û bi minet bi bîr tînim. Bi têkoşîneke bi heybet em xwedî li bîranîna wan derdikevin.

6'ê Gulanê di heman demê de salvegera komploya 1996'an e ku li dijî Rêber Apo hate kirin. Komplo niha jî bi rengê tecrîdê û êrişên qirkirinê dewam dike. Komplogeran bi hêrs şermezar dikim.

Her wiha 4'ê Gulanê salvegera 85'an a Terteleya Dersimê ya 1938'an bû. Canên ku di qirkirina Dersimê de bi rûmetî li ber xwe dan û jiyana xwe ji dest dan di şexsê Seyît Riza-Besê, Alîşêr-Zarîfe û Nûrî Dersimî de bi rêzdarî û minetdariyeke mezin bi bîr tînim. Dewleta Tirk a mêtinger qirker zû yan jî dereng wê hesabê kiryarên xwe bide vî gelî. Heman polîtîkaya qirkirinê îro jî dewam dike û dixwazin qirkirinê temam bikin. Mêtingeriya qirker bi êrişa dagirkeriyê ya li ser Zapê re dixwaze terteleya sed sal e dewam dike bigihîne asta dawî. Lê belê bi berxwedana gel û gerîla ev hesab wê bê têkbirin, wê pêvajoyeke welê bide destpêkirin ku dewleta Tirk a faşîst bi rastiya xwe ya qirker a sedsalî re rû bi rû bimîne. Em bên ser pirsa we; êdî sirek nîne ku PDK'ê bi Tirkiyeyê re hin peymanên cidî kiriye. Eşkere ye ku dixwaze petrol û gaza li Başûrê Kurdistanê di ser Tirkiyeyê re derbasî Ewropayê bike û DYE û Ewropa jî piştgiriya vê dikin. Hin şîrove tê kirin ku krîza gazê ya ku ji ber şerê Rûsya-Ûkraynayê rû da, bi hin aliyan ve bi vî rengî çareser bikin. Lê belê ev şîrove tenê parçeyekî rastiyê ye. PDK bi salan e petrol û gaza başûr difiroşe Tirkiyeyê. Wan bi xwe eşkere kirin ku di vê mijarê de peymanek ji bo 50 salî çêkirine. Sedemeke girîng a pirsgirêkên navbera Iraq, YNK û PDK'ê ev e. Tirkiye xwe dispêre van peymanan û hewl dide ku heta Mûsil û Kerkûkê serweriya siyasî û leşkerî bike. Bi vî rengî dixwaze xwe bigihîne sînorên Mîsakî Mîllî ku armanca wan a sed salî ye. Dixwaze tevahiya Başûr û Rojava dagir bike û siberojê gava ku konjonktureke siyasî ya guncaw bi dest xist, herêmên dagir kiriye desteser bike. Armanca stratejîk a Tirkiyeyê ku bi dagirkeriyê dixwaze pêk bîne teqez ev e; xwegihandina sînorên Mîsakî Mîllî ye. Ji ber ku PKK'ê weke astengiya herî mezin a li pêşiya van armancên xwe yên stratejîk dibîne, tasfiyekirina PKK'ê ji bo xwe kirine pirsgirêka mayindebûnê. Ji xwe PKK li hemberî polîtîkayên qirkirin, dagirkirin û desteserkirinê yên dewleta Tirk a mêtinger qirker, mîna dîwarekî mezin disekine.

PDK piştgiriyê dide plana Tirkiyeyê ya ji bo xwegihandina sînorên Mîsakî Mîllî. Diyar e ku li gorî vê planê li hev kirine ku Başûrê Kurdistanê jî bikin wîlayeteke Tirkiyeyê. Ji ber vê peymana veşartî PDK bi rengekî çalak piştgiriyê dide dagirkeriya dewleta Tirk a li Başûr û Rojavayê Kurdistanê û hewl dide zemîneke rewatiyê ji dagirkeran re ava bike. Tirkiye dixwaze bi dagirkirin û desteserkirinê re Başûrê Kurdistanê bike wîlayeteke Tirkiyeyê û yekî ji Barzaniyan jî bike waliyê wê. Diyar e ku di vê mijarê de li hev kirine.

Tirkiyeyê bi piştgiriya PDK'ê beşeke girîng a Başûr dagir kiriye. Hejmara baregehên leşkerî bi du-sê qatî zêde kiriye. Artêşa Tirk ji baregehên leşkerî yên li Başûr tevdigere û operasyonê dike. PDK'ê derfet daye dewleta Tirk ku ji Başûr êriş bike. Artêşa dagirker ji Şêladizê derbasî Kukrojahro dibe û balafirên xwe ji baregehên li Başûr radibin. PDK bi her awayî derfetên îstîxbaratê, lojîstîkî, ewlekarî, stargehê û ragiahndinê dide artêşa dagirker û bi vî rengî yekser di nava şer de cih digire. Tê gotin, li hin deverên krîtîk leşkerên Tirk bi kincê pêşmergeyan tevdigerin. Lewma jî diyar e ku PDK bi rengekî çalak tevlî plana tasfiyekirina PKK'ê bûye.

**Hevdîtinên dawî yên Mesrûr Barzanî yên li Îngilistanê, bilêvkirina konfederasyonê û hewldanên ji bo vê yekê jî tên zanîn. Ev hewldanên malbata Barzanî çawa dikarin bêne şîrovekirin?**

Balkêş e ku heman piştî hevdîtina Mesrûr Barzanî ya bi Erdogan re derbasî Îngilistanê bû û hin hevdîtin kirin. Diyar e ku dixwaze ji bo peymana bi Erdogan re kiriye piştgiriyê ji Îngilistanê û Ewropayê werbigire. Li aliyê din ev hevdîtin rola Îngilistanê ya di vî şerî de radixe pêş çavan. Divê mirov daxuyaniyên Mesrûr ên li ser Konfederasyonê weke hewldanek ji bo nixumandina peymanên qirêj ên bi Tirkiyeyê re û hevkariya bi êrişên qirkirinê yên dewleta Tirk bêne nirxandin. PDK di nava êrişên qirkirinê yên dewleta Tirk de cih digire. Mesrûr Barzanî ji bo êrişên dagirkeriyê plan bike bi Erdogan re hevdîtin kir. Rastî bi vî rengî ye, di rewşeke wiha de Mesrûr ji bo peymanên qirêj ên bi dewleta Tirk re veşêre û Kurdan bixapîne got, 'Iraq dikare bibe konfederasyonek ji gelek dewletan ku parçe bûye' û hewl dide rastiyê veşêre, berevajî bike. Her wiha ev daxuyanî weke nîşaneya hewldana qutkirina Başûr ji ıraqê û girêdana wê weke wîlayetekê bi Tirkiyeyê re divê bê nirxandin.

PDK ji bo Başûr bike wîlayeteke dewleta Tirk hevkariyê bi dewleta Tirk re dike, bi vî rengî dixebite. Mebesta Mesrûr Barzanî ji konfederasyonê ew e ku Iraq bi rengê dewletên biçûk bê parçekirin, bi rengê konfederasyona dewletokan rengekî nû yê siyasî jê re bê dayin û dewletoka Başûr jî bi Tirkiyeyê ve bê girêdan. Barzanî vê yekê dibêje ne ku Başûrê Kurdistanê di nava sînorên Iraqê de difikire, ji bo karibe Başûr bi temamî ji ıraqê qut bike û bi Tirkiyeyê ve girê bide vê yekê dibêje. Ji xwe rêveçûna heyî ber bi vê yekê ye. Bi rewşa heyî jî Başûr mîna wîlayeteke Tirikyeyê ye. Tirkiyeyê ji aliyê siyasî, aborî, çandî û leşkerî ve serweriya xwe ya li ser Başûr di asteke mezin de misoger kiriye.

Dozeke PDK'ê ya Kurd nîne. Doza PDK'ê ew e ku çavkaniyên Kurdistanê pêşkêşî dewleta Tirk a mêtinger qirker bike, dewlemendiya xwe jî zêde bike. Ji xwe tê dîtin ku malbata Barzanî bi mal û milkên xwe yên li DYE, Ewropa, Tirkiye û welatên kendavê re bi dewlemendên cîhanê re ketiye nava pêşbirkê.



## Girîngiya meha

**Ahmet AKTAŞ**

Weke hinek mehan, di meha Gulanê de jî gelek bûyerên girîng û watedar rûdane. Ji van bûyeran çend heban wisa mirov dikare nişan bide û wan şîrove bike.

Di vê gotarê de bêhtir wê şîrove li ser du bûyerên 6ê Gulanê pêkhatine were rawestandin. Ew jî; yek jê bûyera li sêdarêdana Deniz GEZMIŞ, Yusuf ASLAN û Huseyin INAN(1972) e, ya din jî êrîşa jibo tinekirina Rêbar APO(1996) ye.

Li gel van bûyeran, di wext û demên cuda de gelek bûyerên din ên giring jî hene. Weke bi nav. mirov dikare hinekan ji wanan jî wisa destnîîşan bike:

Di sala 1973an de pêşengekî Şoreşa Tirkiyeyê İbrahim KAYPAKKAYA, ji pêşengên Tevgêra Azadiya Kurdistanê di l978an de Halil ÇAVGUN, di 1982 de, li zindana Amedê Ferhat KURTAY, Necmi Öner, Eşref ANYIK û Mahmut ZENGIN, li Qendîlê Mehmet KARASUNGUR û İbrahim BILGIN, Kasim ENGIN, di komkujiya Hewlêrê de li gel Salih, Hêlin û Ozan 34 şehid.

Hozan Mizgîn(Gurbet AYDIN), Rojbîn Serhat, Ekin Ceren DOGRUAK, Uta SCHNEIDERBANGER, Îdamên li Îranê Şirin ELAMHÛLÎ û 3 hevalên xwe û li Iraqê Leyla QASIM.

Bêguman divê ji şehadetên vê heyvê Haki KARER ti cara neye jibîrkirin.

Ji ber ku ji şehîdên enternasyonalistê pêşêngên despêkê yê Tevgêra Azadiyê ye. Herwiha ji aliye Tevgera Azadiya Kurdistanê ve, roja şehadeta wî 18ê Gulanê (1977), weke roja şehîdan û meha Gulanê jî weke MEHA ŞEHÎDAN hatiye ragihandin.

Em vegerin ser mijara li sêdarêdana Denizan û êrîşa li dijî Rêber APO.

Weke bêrê jî gelek caran hatibû gotin ku dewleta qirker a Tirkan, jibo van rojên êrîşên qirker ên giring; rojên balkêş hildibijêre. Lewma ev êrîşa bir ser Rêber APO, di heman roja 6ê Gulanê ya ku Denîz û hevalên xwe idam kir hilbijart.

Pişti gelek salan, mirovên dewletê yên berpirsiyarên MIT'a wan jî, li xwe mikûr hatin ku ev êrîşa xedar çawa tevgêr kirine û çawa jibo tunekirinê çendîn berfireh xebitine?

Teksiyek 1000 kilo teqemeniya C4 bar dikin û dajon ser warê ku Rêbererî lê dimine. Bi teqîna teksiyê re, erê mirên nabe lê bi bandora wê re gelek avahî derbê dixwun û dengê wê bi çend km'an diçe. Vê êrîşa MIT'a Tirkan, di çapeniyê de bi navê "çalakiya MERSEDESê" gelek deng veda.

Hilbet dewleta tirka û fermandarên wê yên navdewletî ranewestiyan. Jiber ku biryar dabûn; diviya ev "Rêberî" were rakirin, jiber ku li pêşiya dzayna/projeya wan a sedsala 21an kelem bû! Jixwe tê zanîn ev êrîşa wan; êdî mirov bi hêsanî dikare bêjê "PLANGERIYA NAVDEWLETÎ", heta Kenya çû û vegeriya li IMRALI bêhna xwe veda ye!

Dikevin pey kesen ku li ber siyaseta pergala wan asteng bin; mîna Dr.Şivan (bi alîkariya xiyaneta Berzanî) û hwd. jibo ku ji holê rakin, her derfetên xwe û lîskên qirêj bikartînin. Ji ewqas serihildanan, rêberek tinê Dr.Nûrî Dêrsimî filîtî bû. dan pey wî jî, heta Emmanê, Bêrûdê, Şamê, Helebê û Efrînê çûn. Encax dikaribû xwe li Efrînê, bi alikariya Welatparêzên wir ji êrîş û zumla dewleta Tirkan rizgar bikin.

Rêber APO, li ser van mînakan gelek caran diaxivî û digot "ez weke ew kesê ku bermayê ji ber şûr filitî me, Jiber ku piştî şehadetên van pêşangan(Deniz, İbrahim, Mahir û hwd.)jî, nuha yê li derve sax maye; ez tinê me û barê şoreşa Tirkiyeyê jî kete ser milên me"!

Weke Rêber APO dibêje, barê Tevgêra Azadiyê giran bûye, belê paralelî wê destkeftiyên neteweyî û hevalbendiya navneteweyî jî mezintir bûye.

Rêberiya Apoyî ya sedsala 21'ê, bi ser dikeve!



# Celal Zenatî: Dem hatiye ku gelên herêmê li hemberî zêdegaviyên Tirkiyê bibin yek

Celal Zenatî diyar kir ku gelên herêmê ji ber mûdaxeleyên derve gelek êş kişandine û got, dem hatiye ku gelên herêmê li hemberî zêdegaviyên dewleta Tirkan û partiya wî bibin yek.



Dewleta Tirkan ya dagîrker bi êrişên xwe yên domdar yên li dijî bakur û rojhilatê Sûriyê û başûrê Kurdistanê armanc dike ku axa Sûriyê û Iraqê dagîr bike.

Êrişên dewleta Tirk a dagirker ne tenê li ser kurdan xeter in, heman demê xeteriyê li ser tevahiya gelên Rojhilata Navîn çêdikin. Dewleta Tirk hewl dide Osmaniya nû ava bike û Musil û Kerkûkê tev li xwe bike mîna ku sala 1939`an Lîwa Iskenderon tev li xwe kir.

Pisporê zanistên civakî ya Zanîngeha Iskenderiya ya Misirê Celal Zenatî têkildarî mijarê ji ajans me re axivî û got: "Di demekê de ku cîhan bi encamên aloziya koronayê, bandorên siyasî û aborî yên şerê li Ewropa û Ukraynayê, parçebûna cîhanê di navbera alîgirên destwerdana Rûsya li Ukraynayê û dijberên wê de, bêdengiya gelek dewletan li hemberê mijûl e, dewleta Tirk a dagirker êrişî gelên herêmê dike."

Zenatî wiha domand: "Pergala çewsîner a Tirkiyê û partiya wê ya serdest a bi serêkêşiya Erdogan bûyerên li cîhanê rû didin bi kar tîne da ku ajandeyên xwe yên siyasî pêk bîne. Rejîma faşîst a Tirk piştî vekişna hêzên Amerîkayê ji Sûriyê, sûdê ji valahiya siyasî û ewlehiyê werdigire û operasyonan plankirî li dijî gelên Iraq û Sûriyê pêk tîne."

Zenatî behsa siyasetên dewleta Tirk ên li dijî gelên herêmê, di serî de guhertina demografiyê ku li herêmên dagirkirî pêk tîne, kir û wiha pê de çû: "Rejîma Tirk ne tenê demografiya herêmê guhert û siyaseta tirkirinê meşand, ji wê zêdetir komkujî li dijî şêniyan jî pêk anî."

Celal Zenatî diyar kir ku dewleta Tirk bi hemû rêbazan hewl dide tevgerên rewa yên kurdî yên ku gelê herêmê diparêzin, asteng bike û wiha domand: "Dewleta Tirk baregehên xwe yên leşkerî li herêmê ava dike, berhemên gelên herêmê li Iraq û Sûriyê talan dike. Rejîma Tirk navê terorê li tevgerên berxwedanê yên kurdî, Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) û Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) kir. Lê gelek analîzvan îsbat kir ku têkiliyên rejîma Tirk bi komên terorîst re hene di sêrî de DAIŞ û milîsên din ên mîna Artêşa Azad a Sûriyê yan jî opozîsyona ku li otêlên rejîma Tirk de jiyaneke loks dijîn."

**`GELÊN HERÊMÊ JI BER MUDAXELEYÊN DERVE GELEK ÊŞ KIŞAND`**

Celal Zenatî diyar kir ku roj bi roj îsbat dibe ku divê gelên herêmê yên Kurd, Ereb û yên din ku cîhan bi dîrok û şaristaniyê da naskirin, bibin yek û li hember timayên dewleta Tirk bisekinin ku dixwaze li herêmê bibe dagirkereke nû û berhemên van gelên bidize.

Celal Zenatî destnîşan kir ku gelên herêmê ji ber mudaxeleyên derve gelek êş kişandiye û gotinên xwe wiha bi dawî kirin: "Dem hatiye ku gelên herêmê dîroka xwe bi xwe binîvisînin. Divê li hember planên dewleta Tirk û partiya wî bibin yek."

*ANHA*

# Xalid Berkel:

## Rêveberiya Xweser riya rizgarkirina gelên Sûriyê ji krîzê ye

**Xalid Berkel da xuyakirin ku Rêveberiya Xweser riya rizgarkirina gelên Sûriyê ji krîzê ye û got, rejima Şamê bi zihniyeta xwe ya inkarkirin û dûrxistinê nikare ti çareseriyan bîne.**



Herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi projeya Rêveberiya Xweser ber bi avakirina sûriyeke demokratîk ve diçe ku hemû pêkhate tê de di nava aramî û ewlehiyê de bijîn. Lê hikumeta Şamê hîn jî bi zihniyeta xwe ya çewisandin û înkarkirina pêkhateyan ve girêdayî ye, diyalogên navxweyî û hemû çareseriyên aştiyane red dike.

Têkildarî mijarê, hevserokê Meclisa Qanûnsaz a Rêveberiya Sivîl a Reqayê Xalid Berkel ji ajansa me re diyar kir ku rejîma Şama hîna bi zihniyeta înkar û dûrxistinê ve girêdayî ye û çareseriyekê ji krîzê re qebûl nake ku gelê Sûriyê yê ku berdêl dide, rizgar bike.

Xalid Berkel bal kişand ser projeya demokratîk a li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û wiha li axaftina xwe zêde kir: "Projeya Rêveberiya Xweser a li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatiye rûniştandin, projeya rizgarkirina gelê Sûriyê ji aloziyê ye, ji ber ku bi vê projeyê gelên herêmê dikarin di aramî û ewlehiyê de bijîn. Ev proje berovajî çareseriya teng e ku rejîma Sûriyê ji pêkhateyên herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi taybet û ji bo gelê Sûriyê bi giştî re pêşkêş kiriye. Em hêvîdar in ku rejîm Sûriyê nêrîna xwe li ser pêkhateyên li vir û projeya Rêveberiya Xweser biguherîne, ji ber ku zihniyeta wê tu fêdeyê li sûriyan nake."

Berkel anî ziman ku projeya Rêveberiya Xweser, serkeftina xwe îsbat kir û îsbat kir ku ew çareseriya herî guncav ji aloziyê y û hemû pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ev proje qebûl kirine.

**'BI DIYALOGÊ EM DIKARIN BIGIHÊJIN ÇARESERIYÊ '**

Xalid Berkel bang li rejîma Şamê kir ku li gelê Sûriyê guhdar bike û got: "Diyaloga sûrî-sûrî girîng in, girêdana di navbera beşên civakê de xurt dike, ji ber di serhişkiya rejîmê û girêdana wê bi yek zihniyetê de gûrkirina aloziyê dibîne."

Xalid Berkel destnîşan kir ku kiryarên rejîma Sûriyê yên wekî dorpêça li ser deriyên sînor ên bi herêmên Rêveberiya Xweser re xizmeta Sûriyê nake û li dijî têgehan hemwelatîbûn û hemû nirxên exlaqî û mirovî ye û got, rejîma Sûriyê dê bi siyaseta xwe wekî berê dê têk biçe.

Hevserokê Meclisa Qanûnsaz a Rêveberiya Sivîl a Reqayê Xalid Berkel da zanîn ku welatiyên li herêmên Rêveberiya Xweser berê peyama xwe ji rejîma Sûriyê re ragihandin ku di hemû aliyan de bi taybet aborî û jinûve avakirinê baweriya xwe bi Rêveberiya Xweser anîne.

*ANHA*

## Faşîzma tirkî li Sûriyê plana dagîrkeriyeke nû dike

**ZEKÎ BEDIRAN**

Dewleta tirkî qirkirin û tevgera dagîrkeriyê bi hev re dimeşîne. Mînaka vê ya herî berbiçav li Sûriyê dibe. Çawa ku tê zanîn li Sûriyê herêma herî ewle û demokratîk Efrîn bû. Efrîn ku bi zeytûnên xwe navdar e, piraniya wê Kurd bûn. Dewleta tirkî bi edebiyata terorê bû bela û Efrîn dagîr kir. Pirsgirêk bi kuştin û dagîrkirinê sînordar nema. Qirkirina neteweyî kir. Bi sedhezaran malbatên çeteyan ji derve anîn li Efrînê bi cî kirin. Xwediyên wan erdan li şehba û herêmên din bi koçberî dijîn. Dewleta tirkî li Sûriyê hem dagîrker e, hem qirkirinê dike hem pirsgirêkeke aborî ya giran afirand. Herwisa tovê şerekî mayînde çand.

Erdogan li civîna NY nexşeya erdê dagîr bike nîşan dabû û diyar kiribû ku wê ji Efrîn heta Dêrikê bi kûrayiya 30km. erd bide xwediyên wî yên rastî. Herwisa 3 milyon Sûriyên li Tirkiyê li wan herêman bi cî bike. Nexşeya Erdogan nîşan dayî nexşeya herêmên Kurd lê dijîn bû. Erdogan bi awayekî eşkere gotibû, emê Kurdan ji ciyê wan derxin û kesin din bînin ciyê wan.

Tişta ku Erdogan wisa bêpakî û wêrek kirî helwesta Ewropa, Amerîka û welatên erebî bû. Ku bêhelwesta man, wî jî dev ji plana xwe berneda. Dema firsetê dibîne dixebite ku bi cî bîne. Li Tirkiyê niha dîsa mijara koçberan ketiye rojevê. Erdogan li Sûriyê dibe sedema pirsgirêkên pir giran yên navxweyî jî. Ev erd ne vala û bêxwedî ne. Yên ji derve tên anîn wê bi xwediyên erdan re werin hemberî hev. Erdogan erdê kê dide kê? Tuyê hem tevayiya qanûnên navneteweyî binpê bikî û welatekî dagîr bikî, hem sûcên giran yên şer bikî hem bi jimara civakeke welatekî din çawa bixwazî bilîzî.

Van rojan li Tirkiyê dîsa koçberên Suriyê ketine rojevê. Erdogan van koçberan li hemberî Ewropa weke çekekê bi kar tîne. Herwisa wan ji bo aboriya xwe di karê erzan de dixebitîne. Weke din ji bo geşkirina nijadperestiyê û ji bo hilbijartinê wan di siyaseta navxweyî de weke amûrekî bi kar tîne. Li aliyê din ji bo firehkirina herêmên darîrkirî li Sûriyê û sererastirina wî welatî li gorî xwe koçberan weke kartekê di destê xwe de digire. Di gel vê li ser navê van koçberan ji Ewropa bi milyaran Euroyan distîne. Lê ne ev tenê, van koçberan ji bo şer jî bi kar tîne. Îro çeteyên çekdar yên li Azerbaycan, Libya û Sûriyê bi kar tîne, ji van koçberan û herêmên dagîrkirî kom dike.

Erdogan, zorê dide dinyaya derve, bi taybetî Ewropa ku li hemberî êrişên ser Sûriyê û dagîrkirinê destekê bidinê, yan jî bêdeng bimînin. Wisa dihizire ku wê Ewropa jê re bêje, wan bi ser min de neşîne ezê jî çavê xwe ji kiryarên te re bigirim. Erdogan dixebite ku stratejiya qirkirina Kurdan temam bike. Vê wiha dike: Bi jimara Kurdan dilîze, wan ji ciyê wan dike û Ereban, bi taybetî Ixwaniyan li şûna wan bi cî dike. Weke din dewleta tirkî di mijara Antakya de xedîtecrûbe ye. Piştî ku kesên bi xwe ve girêdayî bi cî bike, di salên pêş de wê biçe referandûmê. Wê bêje xelk dixwazin bi Tirkiyê ve bên girêdan û bi wî rengî wan ciyan bi ser Tirkiyê ve bike. Kesê bêje faşîzma tirî ev hesab nekirine di nava xefletê de ye. Erdogan dixwaze ji Helebê heta Mûsil û Kerkûkê tevlî Tirkiyê bike. Ji bo wê Peymana Lozanê rexne dike û qebûl nake.

Faşîstekî weke Suleyman Soylu dibêje, emê milyonek koçberan li Til Ebyed, Serê Kaniyê bi cî bikin. Wisa xuya dike ku ev mijar di rêveberiya tirkî de hatine nîqaşkirin û bûne biryar. Niha rayagiştî ya hundir û derve ji bo vê amade dikin. Ev herêmên mijara gotinê ji Cotmeha 2019an ve di binê dagîrkeriya tirkî de ne. Xwediyên van erdan bi giranî niha di çadiran de koçber in. Çima destûrê nadin ku xwediyên van erdan vegerin, dixwazin ji Tirkiyê bînin li ser wan erdan bi cî bikin? Eşkere ye ka çiqas niyeta dagîrkerên tirk xirab û bixeter e. Ji bo wê divê ti kes nebe amûrê van lîstikên tarî û bixeter û destekê nediyê. Bi taybetî divê gelê Sûriyê bi dijwarî li hember derkeve û destûrê nede ku tovê şerê navxweyî bê çandin.